

ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



13
1986

NAVEROK

J1 Xwendevanan.....	3
Hêmini Şa'ir û Niştimanperwer Mird	4
Hêminê Şa'ir û Niştimanperwer Mır	6
B1 Nurettin Zaza ra Hevpeyvin	8
B1 Ferhad Shakely ra Hevpeyvin	10
D1 Nav Kurdên Gurcistanê da Pêşketina Xebatên Çandi	12
Koma Tiyatroya Kurdên Tıblisê	14
Film, Rejisorê Gurci Çûbabria	15
Wêne, Naveroka Pirtûka Wênekêşên Kurd	16
B1 Hunermend Saydan ra Hevpeyvin	18
J1 Nav Edebiyata Cihanê	20
Serpêhati-Kuştina Hevalê Mın	22
1 Gulan Nişana Têkoşinê ye	23
Komciyina KOMKAR'ê Ya 8' a.....	24
Mamostayên Kurdi Yên Pêşin Mezûn Bûn	26
Pêkeni.....	27
Quncikê Zarokan	28
J1 Nav Weşanan	30

Sal : 7

Hejmar : 56

XWEDI : KOMKAR - Swêd
BERPIRSIYAR : Şeroyê BOTAN
NAVNIŞAN : Döbelngatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08/ 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN
ADRESS : Döbelngatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

● Yuwnanistan

**ŞAHİYÊN ÇANDA KURDÎ
LI YUWNAN**

Dî nav şahiyên ku KOMKAR'ê lî Yuwnan amade kîr cara pêşîn bî navê "Gelên me bîra ne" şahike muzik û fôklora Kurdi bî destê belediya Atinayê ya bî navê Neo Irakliyo pêk hat. Şahiye dî roja 13.4.1986'an da dest-pêkîr û bî rojan ajot. Disa dî roja 14.4.1986'an da lî Atinayê belediya Metemosfosi -Atikis şeveke dîn lî ser çanda Kurdi amade kîr. Serokê van herdu belediyân bî axaftinên xwe yê nî ser bîratîya gelên me va ev herdu şev vekîrîn. Dî roja 16.4.1986 lî Selanîkê bî destê belediya vi bajari lî derva lî meydana bajêr da şahiyên mezî nî hatî nî çêkîrîn. Dî roja 19.4.1986'an da lî bajarê Yeneno programa me berdewam kîr. Dî roja 22.4.1986'an bî destê belediya

● Sovyetistan

Jî berpîrsyarên " Roja Nû" ra silavên dilgermî!

Ez kovarên we çend salî nî dixwinim. Kovar gelek dewlemend, zîmanşîrî nî û bedew e.

Jî we hîvî dîkîm jî mî nî ra kovarê bîşî nî nî. Herusa Şamilê Esker ku ulmdarekî kurde û derheqê Cigerxwî nî da xebatek amade kîrî ye, ew jî rîca dîke ku hûn jî wî ra jî kovarê bîşî nî nî.

Ez disa rîca dîkîm, bona mî nî û bona Şamilê Esker, lî ser navnîşana mî nî, kovara "Roja Nû" û kitabên dî nî bîşî nî nî.

Bî silavên Agîrnak
Ehmedê Zero
Azerbeycana Sovyet

Anfîsa û Navenda Çandî ya bajêr da şahike dî nî hate çêkîrîn. Şahiya dawî nî dî roja 24.4.1986'an da, dî navça bajarê Atinayê dî qesra Sergîrtî ya bî navê Sporting hate pîrozkîrîn. Berî vê şevê Radyo û Televîzyona Yuwnan bî du hevalên me ra hevpeyvî nî çêkîr, û televîzyonê beşeke vê programê hîlda fîlm. Lî ser vê programê dî roja 25.4.1986 'an da, dî nav weşanan da gelek nûçe hatî nî weşandî nî. Gelek rojnaman lî ser van programan nûçeyên cuda-cuda nîvîsî nî. Dî van şev û şahîyan da gelek pîrtûk, materîyal û kasetên kurdi hatî nî fîrotan, lî hemû cîhên ev şahî hatî nî çêkîrîn lî wan deran bî berpîrsyarên çandî va dostanetîyên dîlgermî hatî nî pêkanî nî û ew lî ser pîrsa Kurdi hatî nî agahdarkîrîn. Bî kurtî hemû ev xebatana bî serfîrazi derbaz bû nî.

M. Berwarî

● Sovyetistan

Hevalên Hêja

Slavên pîr germ lî we, jî bo ku hûn kovarekê bî zîmanê dayka gelê Kurdistan dertî nî nî, ev zîmanê şîrî nî ku dîjî mî nî lî welêt lî me qedexe kîrî ye.

Hevalno

Ez xwendekarekî kurdî mî lî Yekîtîya Sovyet. Mî nî xwe fêrî zîmanê kurdi kîrî ye, jî ber wî lo ez dîxwazî mî zîmanê xwe hîneki bî pêş-de bîbî mî. Jî ber ku lî vîr materîyal bî zîmanê kurdi tuneye, ez dîxwazî mî hûn kovarê jî me re bîşî nî nî û heger lî ser we ne zor be, hejmarên kevn jî we jî me re bî rêbîkra wê gelek başbû ya.


Çavê mî nî lî hêvîya kovarê we nî nî û heger hûn çî alîkariyê dîxwazî nî ez amade me.

Bîjî Xebata Welatparêzî.

Bîjî hevkarî û yekîtî jî bo serxwebûna welatê me.

Braderê we lî Mosko
Feysel Xelef

HÊMINÎ ŞA'IR Û NIŞTIMANPERWER MIRD



A. ŞERÎFÎ / Mehabad

Hêste taziyedar û keserbari mergi şore - suwarani meydana edeb û huneri kurdi wek Tofiq WEHBÎ, Yılmaz GUNAY, CIGER-XWÎN, Heseni QIZILCI, Heseni HUŞYAR, SECCADÎ û Qenatê KURDO bûyn, ke be dax û kesereki giranewe dêwezimey merg hêja w zanayeki tirişi le gelekeman hestand û guli jiyani per per kird û Hêminîş barge w bîney berew rêgay nenasrawi merg têk na w êmey be cê hêşt.

Nazanım çon basi Hêmin bikem, le çiy ew piyawe xunşirin û rezasûke bîdwem? Le mêj sal bû Hêminim denasi, şa'ir û helbestvani kurdim le hemû kuçe w kolan û xeyaban, der û dûkani Mehabadda dedi, le korri bezm û şayi w helperkêyan, le êwarani baxi gulan û baxi Mikayeli, le kure rêy gundi Pirbele w Laçin û Seydawa, le qed û pali çiyay Sarimbeg û ser w ber rêy gundi Şilanawê, le qawexanekey Besri w le ku w kuy tır, ew piyawe lesere xo w bê ifade w bê idîayey kurdim dedi, desti de ber piştênekey dena w cixareyekî hemîşe leser lêwan deduwand û çak û xoşiy legel hemû kes, pir û cıwan dekird.

Kesanêki ke mam Hêminyan nenasibaye, katê le kuçe w kolan û xeyabanda tûşyan be tûşi hatiba qet baweryan nedekird eme Hêmini şa'iri gel bê. Piyawêki mamnawendi regeley dem be pêkenin û leserxo w rû xoş û serxoş û cigare leser lêwan.

Egerçi pêw waye kem kes lem Kurdistaneda hebê ke Hêmini nenasê w tenanet be dilniyayiyewe delêm zor kes hen Hêmini le min baştir denasin, belam sereray eweş kur-

tebasêki Hêmin dekem, egerçi jiyani û berberkani w têkoşani Hêmin xoy mesnewiy sed men kaxeze w lem kurte gutareda naguncê.

Mam Hêmin nawi Mihemed Emîni Şêxul-islamiye, le gundi Laçini nîzik Mehabadê le 5/5/1921 le binemalêki nawdari Mukiryani le dayik buwe. Xwêndin û nûsini seretayiy lelay mamosta Seid Nakam fêr buwe (ew kat mamosta Seid Nakam perewazey Kurdistanî Êran debê w le male Şêxul - islami bawki Hêmin dejiya). Pêw waye her em zate lew kateda kari kirdote ser mêşk û bir û baweri Hêmin. Hêmini mindali ewê rojê paşan bû be dilsozêki bê wêne w kurdpewerêki taqane.

Hêmin pê dega w debête mêmîndalêki jir û wuşyar û le gundi Xaneqay Şêxi Burhani legel mam Hejar yektir deqirnewe, debine hawders û hawel û le xîzmet mela başekan û zanakani gundi Xaneqada dirêje be xundin deden û le berewe sa car car legel Hejar nareyan lê de w şîr delên û lasayi Xani w Haci dekenewe. Hêmin gewre debê, pê denête temeni lawi w genci w le gundda xeriki kar û bari cût debê.

Rûdawekani sali 1942 J.K resmen pêk dêt û paş maweyeki kurt kak Mihemed Emin debête endami Komeley J.K be jimare - remzi 55 û nawi nihênîy Hêmin. Kak Ebdulrehmani Zebihî be nawi nihênîy Bêjen, endami jimare 1'i komele, Hêmin bo beşi propagende w teblixat heldebijêrê. Hewelin şîri Hêmin le jimare 2'y govare Niştîman, organi komitey nawendi J.K' êda be nawi nihênîy Ş. Hêmin bilaw debête.

Xwendevanên Hêja !

Me ev gotara A. ŞERİFÎ, hem bi kurdiya başûr (sorani) û hem ji bi a bakûr li gel hev da, ji ber ku nivis bi xwe, bi sorani û bi tipên latini gihişte destê me û me cih da wê, lê ji bo ku xwendevanên kurmanciya bakûr bikaribin bi hêsani vê gotarê bixwinin, şa'ir û welatparêzê Kurd

HÊMINÊ ŞA'IR Û NIŞTIMANPERWER MIR

mam HÊMIN binasin, me zimanê gotarê, li gor kurdiya bakûr hêsan kir û cih da wê ji. Lê em hêvidarin ku xwendevanên me ji nuha şûnda ji, nivîsên bi zaravê sorani û bi tipên latini, ji Roja Nû ra bişinin, da ku di kovarê da xwendevan bikaribin bi zaravên din ji bixwinin.

Redaksiyona ROJA NÛ.

A. ŞERİFÎ

Hê em di taziye, şin û keserbari ya mırina tekoşerên meydana edeb û hunera Kurdi wek Tewfik Wehbi, Yılmaz Guney, Ciger-xwin, Hesênê Qızilci, Hesên Hışyar, Eladdin Secadi û Qanatê Kurdo da bûn ku bi dax û kesereke giran rawestiyar, mırina rûsar zana hêjayeke din yê Kurd ji gel stend û gula jiyanawî hilweşand û Hêmin berê xwe da axa sar û em tenê hiştin.

Nizanîm çawa destpêbikim? Qala çiyê wi merivê şirin û baş bikim. Ji mêj va ye ku min Hêmin nasdikir. Her wext li kolanên Mahabadê da li ber der û dikanan; di dawet û dilanan da; êvaran li Baxê Gulan li Baxê Mekayili; li pala çiyayê Serim Beg û li ser riyayê gundê Şilanawê; li qahwexaneke Besrê; li Koyê û li Kuweytê, min ev merivê dilnêr yê Kurd didit. Destê wi di ber piştê da, cixara wi ji hertim di dev da û hulmeke dûr û dirêj lê dîda. Dostê herkesi bû, bi herkesi ra di da û distend.

Kesên ku Hêmin nasbikira û li kuçeyekê da rasti wi bihata û bidita, wê bawer nekirana ku ev şairê gel Hêmin e. Merivê ne pir dirêj bû, hineki zirav, dev bi ken, rûken bû û cixara wi ji hertim li ser lêvan bû.

Li Kurdistanê kêma kes hene ku Hêmin nasnekim. Bi dileki emîn dikarim bibêjim, ku kes hene ji min bêtr û baştir Hêmin nasdikirin. Lê, li gel vê yekê ji ezê behsa Hêmin bikim; di vê kurtenavisa xwe da her çendi behsa biserhati, xebat û tekoşina wi bikim ji, disa têr nake. Navê mam Hêmin yê rast Muhemmed Emîni Şêxulislam e, li gundê Laçini, nêzîki Mahabadê sala 5.5.1921'an da

ji dayika xwe bûye. Hêmin ji maleke navdar ya Mukriyaniyan bû.

Xwendin û nivîsandina pêşin li cem mamoste Seid Makam fêr bû. (Wê wextê mamoste Seid Makam ji mecbûri ilticayî Îranê kiribû û li mala Şêxulislamê bavê Hêmin dijiya.) Her weha Seid Makam tesir li ser bir û baweriyayê Hêmin kir. Ew mîndalê wê rojê piştê bû dîlsoz û kurdperwerekî bê hempa.

Hêmin têdîghê û dibe xortekî jir û şiyar û li gundê Xaneqa yê Şêx Burhan, ew û Mam Hejar hevdu dibinin û li ber destê meleyên herî baştirin dest bi xwendinê dikin. Û her weha di ber xwendina xwe da şîrên Ehmedê Xani û Hacı Qadiri Koyî ji dixwinin.

Hêmin êdî mezîna dibe û di gund da bi kar û barê cot va hûr dibe.

Bûyerên 1942'yan fersendek gelek mezîna da ku Komela J.K pêk bê. Roja 25'ê Gelawêj (Temmûz) ya 1942'yan da J.K. bi awayekî resmî pêk tê. Piştî demeke kurt Muhemmed Emîn (Hêmin) dibe endamê Komela J.K., bi kodnumara 55 û bi navê dîzi (Nihêni) Hêmin û navê wi li welat belav dibe.

Ebdurehmani Zebihî ku bi navê nihêni (dîzi) Bêjen û bi kodnumara 1'i di komelê da ye, ew ji bo beşê propaganda û ajitasyonê Hêmin hildibjêre. Şiira Hêmin ya yekemîn di hejmarê 2 ya Kovara Niştîman ya organa Komîta Navendi ya J.K da bi navê dîzi M.Ş. Hêmin derketiye.

Şert û şîrûtên dinê û yê Îranê fersendek da ku di 1945'an da Komara Demokratîk ya Kurdistanê li Mahabadê hat damezrandin. Komela J.K ji navê xwe guhîrand û

bû Partiya Demokrata Kurdistan. Hêmin ji li gel dostê xwe Hejar, herdu bi hevra dibin karbidest û karkerên vê Komarê û Partiyê û bi dil û can li gel Pêşewa Qazi Muhemmed kar dikin. Vê carê ji gotar, şîir û nivisarên xwe di kovara Kurdistan û weşanên din yê Partiyê da çapdikin.

Pîştî demeke kurt, pîr naçe ku leşkerên hukumeta Muhemed Riza Şah êrişê ser Kurdistanê dike. Zîlm û zordestiyeke pêk tine, ji ber vê yekê Hêmin û bi sedan tekoşerên Kurd mecbûr dimînin derdikevin dervayî welat. Hêmin heta têkçûna hukumeta Dr. Mussadiq ji her li derva dimînê, nikare vege-re. Di dema surgûnê da, bi şev û roj li gund, bajar û çiyayan tim digere.

Dewr diguhure, êdi li welat aramek (bê-dengiyek) peyda dibe, Hêmin êdi vedigere welêt, tê gundê xwe Şilanawê û li wê derê xwe dide kar û barê bax û bostanên xwe.

Bi tevgera çekdari ya sala 1967 —1968'an ya li Îranê carekê din Hêmin hildide û li dij hukumeta Şah radibe. Lê gelek zîlm û zor lê tê kîrîn, ew vê carê ji xwe zû xelas dike û diçe Kurdistanê Iraqê. Piştî Mamoste Hejar ji xwe digihine wi.

Heta biserketina raperina (serhildana) gelê Îranê ya sala 1979'an Hêmin her li deşta dijiya. Lê piştî ku hukumeta reş ya Şah hate hilweşandin, Hêmin vedigere welêt û li gundê xwe li Şilanawê bi serbestî diji. Demekê, Hêmin xwe dide kar û barên siyasi, lê bûyerên siyasi tesîrek gelek mezin lê dike û ew dev ji kar û barên siyasi berdide. Piştî bi hevkarîya çend kesên din li bajarê Urmiyê dezgehê bi navê Çapxana Selahaddinê Eyyûbî saz dikin û kovara Sirwe rasterast di bin mesûliyeta Mam Hêmin da, bi zîmanê Kurdi derdixin. Di vê navberê da hîn pirtûk û broşûran ji çapdikin.

Lê mîxabîn, ku wexta hejmara 4'an ya Sirwe derket, Hêmin di şeva Pêncşemê 17 Nîsan 1986'an da li Urmiyê li mala xwe çû ser heqîya xwe û em û Sirwe li ortê sêwi hiştin.

Laşê pak û pîroz yê Hêminê şairê gel, Hêminê nivîskar, Hêminê Kurdperwer di yaniya 18. 4. 1986'an da ji Urmiyê anin Mahabadê û li goristana Bûdaq Sultan da veşartin. Di weşartina cenazê wi da gelek kes ji hemû bajar û gundan, ji çar perçên Kurdistanê hatibûn û ser cenazê vi şairê gel hêsrên xwe rijandin. Li bajarên din ji, wek li Mahabad; li Urmiye, Bokan, Sine, Kermanshah û

Tahrane taziya wi hat kîrîn û di taziye da şîir û gotarên wi hatin xwendin. Mam Hêmin tenê kureki wi heye, bi navê Kak Selah.

Berhemên Mam Hêmin ji dervayî yê ku di kovar û rojnamayan da derketine ev in:

- 1— Tarik û Rûn
- 2— Naley Cudayi
- 3— Hawari Xali
- 4— Paşerok

Yên ku Mam Hêmin pêşgotina wan nivîsandiye ji ev in:

- 1— Tuhfeyi Muzefferiye
- 2— Pêşgotin Ji Bo Kitêba Kela Dîmdîm Ya Erebi Şemo.
- 3— Pêşgotina Kitêba Pêkenina Gedeyan
- 4— Pêşgotina Diwana Nali

Berhemên wi yê ku nehatine çapkirin:

- 1— Kela Dîmdîm ya Erebi Şemo ji Kurdi wergerandiye Farisi.
- 2— Kitêba Xirmegez ji farisi wergerandiye Kurdi.
- 3— Şêxzade û Geda ya Mark Tuwin ya ku ji Farisi wergerandiye Kurdi.
- 4— Kitêba Tekstên Folklorê Kurdi ya Qanatê Kurdo ji Kurdi wergerandiye Farisi.

Gelek şîir, gotar û nivîsên wi yê ku nehatine çapkirin ji her hene.

Ezê li ser şîir û naveroka şîirên Hêmin tîştêki nebêjim, vê yekê ji ji şîirnasên kurdan ra dihêlim, bila ew li ser vê yekê bibêjin

Di dawîya vê gotara xwe da, divê ez bibêjim, ku bi rasti Hêmin şaireki mezin, meriveki qenc û mezin yê Kurd bû, rûken, emekdar û zîman xweş bû. Kurda meriveki xwe yê mezin windakir. Ev beyta jêrin ya Mam Hêmin di kovara SIRWE da, di hejmara 4'an da çap bûye:

*Gelêkîm rojgari tal û şîirin rabuward, axo
Merg mewda deda disan bibinim serdemêki
tir!
Ewende derdedar û bê peristarim ke pêm
waye:
Leser kêki temen helnakirê taze şemêki tir.*

Ewroke em ji, her wek mam Hêminî şa'ir, dibêjin:

*Şiwênî min şîinî kurdi bêbeşe
Ew geley haşa deken lêy û heşe*

b1

Nurettin Zaza ra hevpeyvîn

Roja Nû derheqa jiyân û xebata Kek Nurettin Zaza û raya wî li ser xebata zman, çand û edeba Kurdi ya iroyîni jê pîrsî û bersivên wî li jêr diweşîne. Dî nwisandîna Kek Nurettin da (î û î) me gora nwisandîna kovarê (î û î) guhîrand.

R.N — Mamostayê hêja, hûn dixwazîn derheqa jiyana xwe da jî me ra bêjin? Zarotî, xortanî û yê mayîn? Hûn kingê û çîma jî welat derketin?

N.ZAZA — Ezbenî, lî ser van tîştan, ez niha tîşteki nabêjim. Çîma? Jî ber ku, bî navê "Mavi de Kurde" —Jina min a Kurdi—" min kitêbek nîvisandiye. Rojname, radyo û televîzyonên Swîsre û Fransa pîr bî xweşî behsa wê kir û kesên ku wê dixwînin şahîya xwe nişan didin. Lê tevi vê yekê, ev kitêb ne hate wergerandin zîmaneki din. Niha, jî min bî xwe nayê ku ez wergerînim Kurdi an Tîrki. Lê min pîr hez dîkir ku berî Kurdi, ev kitêb, jî alîki nîvîsevaneki hêja ku xweş bî Fransîzî dîzane, bête wergerandin Tîrki. Jî ber ku kesên ku (Kurd û Tîrk) wê bîxwînin jî xwendevanên ku wê bî tenê bî Kurdi bîxwînin wê bêtîr bin. Jê pêve, wergera wê, bî Tîrki wê jî Kurdi çêtîr derkeve.

R.N — Derheqa Hawarê û xebatên we? Pîştî Hawarê, Ronahî û Roja Nû, wekî zanîna me, bî demeke dirêj -qasî 20—25 salî- lî Rojhilata Navîn û lî Ewropê bî kurmancî kovarek derneket. Sedem çî bû?

N.ZAZA — Hawar, Ronahî û Roja Nû dî zemanê Fransîz de derketin. Hîngê, jî bo Kurdan, lî Sûriyê û Lîbnanê hînek serbestî hebû. Pîştî ku Erebên faşîst hatin ser hukîm, ev serbestî nema. Dî gel vê yekê, bî dîzî, min lî Sûriyê û Lîbnanê hîn kitêb û kovar derxistin. Wek Memê Alan, Şîvanê Kurd, Şerê Azadî (Bî şîr e û lî ser şerê Kurdîstana Iraqê ye, heya sala 1961). Jî van pêve, gava me civata Xwendekarên Kurd Lî Ewropa dani (cara pêşîn dî sala 1949 an de bû). Me hîngê (bî rastî min), bî navê Dengê Kurdistan, bî Fransîzî û Kurdi, kovarek derxist. 12 hejmar jê derketin. Niha yek jî peyda nabe. Gava, dî sala

1956 an de ez vegeyîyam Sûriyê, min hemî kaxîtên xwe lî cem hevaleki hiştibûn. Dî vegeyî xwe da (sala 1970), jî van kaxîtan tu tîşt nemabû.

R.N — Niha lî ser çî kar dîki? Efrandînen ku dî bîra we da ne bo paşeroj?

N.ZAZA — Niha, ez dixebîtim ku nanê xwe derêxim û carna jî arîkariya Kurdên "Bext-xwestî" -iltîcaci- dîkim.

R.N — Hûn lî ser xebata iroyîni dî warê zman, çand û edeba Kurdi da çawa difikirin? Problemên gîring çî ne û çawa safî dibînin? Ray û pêşneyarên we? Her usa jî lî ser kovara me?

N.ZAZA — Ez hej pîrsên (bêjeyên, gotînen) "iroyîni" û "gîring" nakim. Kurmanc "xebata iro" an jî "xebata roja iro" dibêjin. Ev "iroyanî" jî ku derketîye, nîzanîm. "Gîring" jî, jî Soranî hatiye, û çî ye, nîzanîm. Pîraniya bêjeyên ku jî Soranî dîkevî Kurmancî bê aheng û bê mûsiqe ne û bî Kurmancî ve xweş nayên girêdan...

Roja Nû dîgehe destê min û çîqa jî min tê, ez wê dixwînim. Tîştê bîngehî ew e ku hûn wê bî Kurdi derdixînin, pê Kurmancî pêşde dibînin û xwendevanên xwe bî gelek tîştan ageh dîkin. Ez hêvidar îm ku ev xebata ha neyite rawestan û her dîçe, çêtîr û bîlîntîr bibe.

Belê, herwekî min gotîbû, hûn zîmanê Kurmancî bî pêşde dibînin, lê ez bî xwe, jî rengê ku vê pêşveçûna ha gîrtîye, ne dîlxweşîm. Berê jî, lî hîn cîyan de min gotîbû, da ku em bîkarîbî xweş bî Kurmancî bînvîsîn, divê ku em Rêzîmana Celadet û Lescot xweş nas bîkîn. Jê pêve, divê em hemû bî awakî bînvîsîn. Lê, nîvîsevanên me welê nakîn. Hîn hene dixwazî wek Kurdên Sovyetîstanê bînvîsîn. Lê, divê em bîzanîn, tevi xebata Qa-

natê Kurdo û hin dîn, Kurmanciya Kurdên Sovyetistanê riyeye xwar girtiye. Misalek ji te re. Kurdên Sovyet welê dibêjin: Hesen hatiye kuştinê, "Hesen öldürülmüş" —Ev tîşt ne rast e. Bî kurmanciya rast usa tê gotin: Hesen hatiye kuştin, "Hesen öldürülmüş". Hesen hatiye kuştinê: "Hesen öldürmeye gelmiş". Mesela: Hesen hatiye kuştina min... û gelek tîştine dîn.

Jê pêve, hûn pirsine nû ji Kurdiya Sorani dibin. Ez dixwazim ku rojekê em bîbine xudi yek zîman. Lê, ev tîşt pîr dem, xebat û kês dixwaze. Divê ku em xwe nelezin. Ku me xwe lezand em ê zîmaneki welê pêkbinin ku pîr xwar û mar be û tu kes jê tîşteki fe-

him neke. Û carna ji hûn bêjeyine welê derdixinin ku ji bo pîraniya xelkê pîr xerib û dijwar in. Gelek caran, ez bî xwe tu tîşt ji wan dernaxinim. Ez ne dî rewşeke welê de me ku, dûm û dirêj, hûr û kûr li van tîştan bî-nêrim û şaşî û çewtiyên rojname û kovarên Kurdi bêxîme ber çavan..

Dî ser van tîştan pîr xebat û dan standin gerek in. Lê, herweki em bê dewlet, bê zanin-geh, bê akademi û bî serde ji hezar perçe ne, bîvê nevê, em ê bî dijwari bî rê ve herin û pêşkevîn. Lê divê em netîrsin, dom bî xebata ku me tê bîkin û nexweşiyên xwe derman bîkin. Me li gora kanina xwe kîr, niha bar li ser milê we ye. Xwe sist mekin !



JI XWENDEVANEKÎ

HELBESTEK

baranê lêkîr
azman dîkele
çiya ewi mij bû ne
gul li vebûnê ne
mina singê keçek bûkîni,
bî hêviyek nû...

baranê lêkîr
roja sor li paş e
tirîja kesk û sor xuya bû
bêrivan amade bûye
ku kulilkan komke.

baranê lêkîr
pîncar kulilk hişk nabîn
newroz hûstuxwar nine
pêşmerge tîfîng li ser mil
çiya mor bûne
ala me ê azad be
keç û xort amadene
xebata mezîna ra.

TIRÎJA KESK Û SOR

çiya sor bûne dotmam
tirîja kesk û sor û zer avêt.
hêdi hêdi
baranê bîsîkîne.
çiya xemilîyan
bî gul û gulikan
xebat pîr xweşe
ji bîndestiyê dûr
bî şahî û hêvi.


baran bereket
bî ronî û germî
disan dibare.
baranê lêkîr...

Mikayil ROJASOR

Bî Ferhad Shakely ra Hevpeyvîn

Helbestvan, nivîskar û dersdarê xwendegêha bilînd, Ferhad SHAKELY, jî Kerkûkê (Kurdîstana Iraq) ye. Ew di sala 1979'an da hatiye Swêd û li wir ciwar bûye. Heta nuha 3 diwanên wî hatine weşandin. Herusa bî navê "Çiraya Azadi" pirtûkeke zarokan bî tipên latîni û kurmanciya jorê nivîsiye. Wî, ev hikayeta erebî adapteyî kurdî kirîye. Di sa wî, Lars Bakstrom û Bextiyar Amin bî hevra pirtûka şair GORAN "Fîrmêsk û Huner" wergerandiye Swêdi. Lêkolîneke wî li ser hozanê mezin Ehmedê Xani, bî du zîmanan — Swêdi û Îngilîzi — hatiye neşîrkirin. Shakely, herusa redaktorê kovara "Svensk - Kurdisk Journal" û "Mamostayê Kurd" e.

Shakely, du salên bori li xwendegêha mamostatîyê dersên kurdî da. Ew nuha li zanîngeha Uppsala, di Înstîtuya Zîmanên Îrani da dixwîne û her li wir dersên zîmanê kurdî jî dide.



R. NÛ : Li ser Ehmedê Xani lêkolîneke we bî zîmanê Îngilîzi û Swêdi hatiye neşîrkirin. Di vê lêkolînê da, we çî ditînên nû li ser Xani anîye pêş ?

F. SHAKELY : Nivîsîn li ser Ehmedê Xani karek e, heta bêjî xweş, lê dijwar û zehmet. Pêştir gelek caran pirtûk û gotar û vekolîn li ser Xani hatine nivîsin. Bêguman her kesek jî xwastiye tiştêki nû bînivîse û pêşan bide. Mîna di lêkolîna xwe da jî çend alîve berhemên Xani wergerîne, lê xala (nuqtaya) girîngtir bo mîna "Kurdayetî" bû. Gava ez dibêjim kurdayetî mebesta mîna ew bir û bawer e ku dibêje neteweyê kurd, wek her neteweyekî din di cihanê da mafê wî heye ku dewleta wî ya netewayetî û serbixwe hebe. Ev bir û bawer, yan ev maf, bî zîmanê iro yê modern û siyasî bî navê "mafê gelan bo biryardana çarenûsa xwe" hatiye naskirinê. Xaniyê mezin berî 300 sal, di Mem û Zîna xwe da bî şeweyeka gelek aşkera vê bir û bawerê xîstîye nav çarçeweya dastaneka edebî ya gelek berz (bilînd) û bînx û hêja. Jî wî zêdetir jî Xani programek bo rîzgariya kurd û Kurdîstanê amade (hazîr) kirîye. Programa Xani, heta roja îroyî kevn nebûye.

Lêkolîna mîna ku bî navê "Kurdayetî di Mem û Zîna Ehmedê Xanîda", bî zîmanê Îngilîzi û Swêdi belav bûye, tenê xwestîye vê programê, bî şeweyeka zanîstî û akadêmî pêşkêş bike. Ditînên ku mîna anîne pêş nûne, yan ne, ez nîkarim tiştêki bêjim. Xwen-

da, ronakbir û rexnegirên kurd, jî mîna çêtir, dikarin lîser bîpeyvîn û bînivîsin.

R. NÛ : Li ser pêwîstîya têkîlbûna zaravên kurdî —kêmasî di zîmanê nivîsandîne da— ditînên we çîne ?

F. SHAKELY : Di hevpeyvîneka weha kurt da mirov nîkare, baş û bî dilê xwe, gut û bêj lîser babeteka girîng, mîna zîmanê kurdî, bike.

Dabeşbûn û parçebûna Kurdîstan di nava çend welatên cuda, ku jî alîyê siyasî, netewayetî û ferhengî (kultûrî) ve jî hev dîrin, karê yekgirtîna gelê kurd, û yekgirtîna welatê me û zîmanê me dijwar kirîye. Lê pîrs ne tenê ev e; paşxan (background) a Kurdîstanê ya diroki (mêjûyî) jî roleka gelek girîng di jîyana me ya îroyî da dilîze. Zîmanê kurdî, iro, bî du zarawa, kurdiya başûr (Sorani ?) û kurdiya bakûr (Kurmancî), û bî sê alfabê, Arebî, Latîni û Krîlîk dihêlî nivîsin. Kurdiya başûr, jî ber çend hoyên (sebebên) siyasî û diroki, zengîn (dewlemend) e û mirov dikare bêje bûye zîmanekî standard, lê derfet (fîrset hel) neketîye destê kurdiya bakûr ku pêş bikeve. Eger bawerîya me bî yekbûna gelê kurd û welatê Kurdîstanê hebe, divê bawerîya me bî yekbûna zîmanê kurdî jî hebe.

Zîmanê kurdî yê standard, bêguman, bî yek roj û du roj çê nabe. Divê (pêwîst e) em zevîya wî amade bikin. Bila ronakbirên kurd fêr (hîn) bîbin bî herdu zarawayên kurdî û bî hersê alfabê bîxwinin. Nivîskar û rojnameva-

nên kurd dîkarin (û divê) sînûrên navbera zarawayan bîşkênin û peyvên (wuşeyên)kurdi, bê tîrs, bê tengbîni bî kar binin. Têkelbûna zarawayên kurdi gaveka gîring û pêwîst e. Zîmanzanên kurd dîkarin (û divê) lîser guhortîna bînema (qaide) yêrên rênivîs û rêzîman jî bîr bîkîrîn (bîfîkîrîn)...!!

R. NÛ : *Dî derketîna weşanên kurdi da, van salan pêşketîneke berbiçav heye. Jî ber tunebûna zîmanekî yekgirtî û hîn şertên din, dî van weşanan da gelek cudatî û kêmasiyên rastnîwîsandîna kurdi hene. Lî ser vê yekê çî ditmên we hene ?*

F. SHAKELY : Derketîna û belavbûna rojname û çapemenî (metbûat) ên kurdi dilê hemû kurdekê dilsoj û niştîmanperwer xweş dîke. Xwezî bî sedan kovar û rojnameyan, û bî hezaran pirtûkên me hebûna.

Tîştê ku mirov pê diêşe ewe ku pîraniya weşanên kurdi, lî Ewropayê, jî aliyê nave-rok, zîman û rastnîwîsî ve pêş neketîne. Ez bawer dîkîm dî vê rewşê da mirov dîkare du xalên (nuqtayên) gîring destnîşan bîke:

A— Başbûna zîman û rastnîwîsî bî pîrsa yekbûn û pêşxistîna zîmanê kurdi ve hatiye gîrêdan. Bersîva pîrsîyara du wemîn beşekê jî vê behsê pêşkêş dîke.

B— Pîraniya rojname û çapemeniyên kurdi jî aliyê partî û komelên sîyasî ve dîhên weşandin. Mîxabîna partî û komelan tenê bî çavê sîyasî lî meseleyên zanîstî jî, wek meseleyên zîman û ferheng, dînêrîn.

Jîbo çareser (îlac) kîrîna vê rewşê divê rûnakbîrên kurd, bî taybetî kesên ku dî kovar û rojnameyan da kar dîkîn, zîmanekî zanîstî, zîmanekî hawbeş (muşterek) jî xwe ra peyda bîkîn, ta bîkarîna bî hev ra bîpeyvîna û guhdariya hev bîkîn.

R. NÛ : *Wek mamosteyê xwendîngeha mamostayetî, beşa kurdi, hîn encama van du salên xwendîne yêrên derbazbûyî çawa şîrove-dîkîn ?*

F. SHAKELY : Bî rastî du salên karkîrîna dî xwendîngeha mamostayetiyê -beşê kurdi da, jîbo mîna, azmûneka (tecrube) gîring û xweş bû. Mîna dîrsa gramatîka kurdi û dîroka edebiyata kurdi dîda. Nuha ez baştir bawer dîkîm ku mirov dîkare bî hasanî zarawayên zîmanê kurdi û edebiyata kurdi bî şêweyeka zanîstî û sîstematîk dî xwendîngehan da bî kar bîne.

Hevalên ku du salan zîmanê kurdi xwendîna, nuha bî çavekî dî, bî çavekî vekîrîtir lî pîrsên zîman û edebî dînhêrîn. Xwendîngeha mamostayan lî Stockholmê nîmûneyek û destpêkeka baş e bo amadekîrîna mamostayên kurd.

R. NÛ : *Tê gotîna wekî hîn karê mamostayetiyê beşa kurdi berdîdîna ?.. Lî gor ditîna me her çend ev cara yekemîna bû jî, we û kek Reşo Zîlan xebateke hêja kîr. Derçûna we jî vî karê han valahiyekê dîhêle. Kesekî dîna ku zaravên kurdi baş bîzanîbe û vî karî baş lî rê bîbe heye ?*

F. SHAKELY : Rast e ez êdî lî xwendîngeha mamostayetiyê da kar nakîm, lê dîsan naçar îm karê mamostayetiyê bîkîm, çûnku lî zanîstgeh (university) a Uppsalayê jî dîrsa zîmanê kurdi heye.

Xebata me çend hêja bû, ez nîzanîm, lê hêvidar îm mamostayê jî mîna çêtir çîhê mîna bîgîre. Kesên dîna hene, çîma tune..?! Keç û kurên kurd dîxwînîna û pêş dîkevîna û bêguman mamosta, zana û kesên jêhatî dî nav wana da hene û dê peyda bîbîm.

LI SOVYETİSTANÊ

DI NAV KURDÊN TIBLISÊ DA

PÊŞKETINA

XEBATÊN

ÇANDI

- * Tiyatro
- * Kom û Asambleyên Musik û Govendên Kurdi
- * Film
- * Xebatên Wênekêşiyê û Hunerên Bedewtiyê yên Dîn

Çawa tê zanin, iro li Sovyetistanê sed û pênci netew, di bin ala sor da, di nav azadiyê da wek bira bi hevra dijîn. Sazûmana sosyalizmê, di navbera gelan da cûdabûnê nasnake, çî gelên biçûk û çî ji yên mezin. Ji wan gelên biçûk yek jê ji gelê me ye. Kurd li çar komarên Sovyetiyê, bi gelên din ra wek bira dijîn. Îro idi baş tê zanin weki sosyalizmê çî daye gelê me, ku hejmara wan, li temamiya Sovyetistanê tenê 216 hezar in. Sê merkezên kurdolojiyê xebatên gelekî hêja dikin. Ziman edebiyat û çanda gelê Kurd tenê li Sovyetistanê bi serbestî rîya pêşveçûnê ditiye. Li ser rewşa Kurdên Sovyetê me heta nuhagelek caran nivîsiye. Li vir emê tenê li ser hin xebatên çandî yên Kurdên Gurcistanê rawestîm.

Li Komara Gurcistanê, di nava bajarê Tîblisê da 26 hezar Kurd dijîn. Bi hejmar, ew ne gelek in, lê di nav wan da hejmara ronakbiran, zehmetkêşên çanda kurdi, alim û hunermendan gelekî bilind e. Ji nav civata Kurdên li Tîblisê, heta nuha nivîskar, artistên bale û operayê, muzisyen, fotbolist û wênekêşên bi nav û deng derketine.

Li ba Kurdên Gurcistanê, bo pêşdabırina çanda kurdi daxwaz û berpirsariyeke xurt heye. Li wir xebatên çandi (kulturi) gelekî pêşdaye; tiyatro komên stran û govendê gelekî serfiraz in.

Wek Roja Nû me bi hin kesên serwêr û rêber ra qise kir, wan li ser hin kar û xebatên xwe em agahdar kirin. Em ji wan agahdariyan dîgihên xwendevanên Roja Nû.

yize.

Îsal heft sal e, koma tiyatroya me xebatên zehf qenc dıke. Bona van xebatan, dewlet hemû imkanan dıde me.

R. NÛ: Heta niha we çend piyes dani-ne?

M. Û. CEWERÎ: Dı nav van 7 salan da me heft piyesên baş pêşandane. Piyesa pêşin ya Eskerê Boyik bû, bı navê "*Sinco Qiza Xwe Dıde Mêr*" ; ya duwemin "*Cinar*" ya Yogayev ; "*Siyabend û Xecê*" ya Tosnê Reşit ; "*Hela Hê Erebe Welnegeriyaye*" ya Utya Juseliyan ; "*Zavê Jı Welatê Der*" ; "*Çiq-lê Sipindarê*" û nuka ji "*Tahir, Zahir û*

M. Û. CEWERÎ: Wek mın go, dewlet imkanan dıde me. Kesên ku kar bıkın, tevi vê xebatê bıbın hene. Tıştê ku ez zehf jê hezdıkım ew e, weki roj bı roj keç û xortên teze dıxwazın tevi me bıbın; bı me ra bıxebıtın. Lê dı destê me da piyes kêm ın. Nıka xebatek heye weki piyesên kevn û nû bı zımaneki zelal bêne amadekırın. Eger dı destê we da jı piyesên bı zımanê kurdi he-bın û hûn jı me ra bışınım emê zehf ra-zi bıbın. Vê payıza han emê piyesa "*Siyabend û Xecê*" disa bılızın. Dı ro-la Siyabend da Têmûrê Çıldergûşı û dı rola Xecê da Naza Xeto wê bılızın.

KOMA
TİYATROYA
KURDÊN
TIBLİSÊ



Tapi" dı bernama me da ye, em lı ser teksta wê dıxebıtın. Dı meha Gulanê, êvariya (şeva) şıirên Ferikê Ûsiv da emê vê piyesê pêşkêş bıkın.

Rojnameyên Gurcistanê lı ser xebatên me pır nıvisin û bı pesın kıırın.

R. NÛ: Çı kêmasi û hewcedariyên we hene?

R. NÛ: Hûn dıkarın lı ser serwêr û artistên xwe çend gılıyan bıkın?

M. Û. CEWERÎ: Serwerê Komê Andoyê ÇILDERGÛŞÎ ye. Naza Xasti, Naza Xeto, Kulilka Eso, Gulçera Ûsif, Besa Memûd, Temera Cangir, Lina Sebri, Guramê Miraz, Titalê Evdo, Şalikoyê Sefo, Titalê Hemid, Titalê Palo,

Iskoyê Úsif, Şalikoyê Miraz, Tê mûrê tên tiyatroyê ne.
Keleş, Tengizê Memê û yên din artis-



FİLM



Rejisorê Gurci Çûbabria dî nav komek Kurdên Tıblisê da.

ÇÛBABRIA: Ez dıxwazım lı ser Kurdan hın filmên dın ji çêbıkım

Çawa tê zanin dı sala 1983 an da lı Gurcistanê, lı ser jiyana Kurdên Tıblisê, ji aliyê rejisorê gurci Gia ÇÛBABRIA filmeke dokumenter hatibû çêkırın. (Nûça çêkırına vê filmê, me dı Roja Nû hejmara 2' an da dabû).

Dı serdana (ziyaret) ma-mosta vi xwendekarên Kurd da, ku dı meha Nisanê da ji Stockholmê çüne Sovyetistanê, Çûbabria filma xwe nişani mêvanan da; lı ser filmê dıtın û ramanên wan girt û bersiva pirsên wan da.

Lı ser pırsa: " We çıma pêwist dıt û lı ser Kurdên Tıblisê film çêkır" weha bersiv da ÇÛBABRIA:

—Mın ji cımaeta Kurd gelekı hezkır. Zaroktıya mın dı nav Kurdan da lı taxeki derbaz bû. Mın xwest ez vê cımaeta piçûk, çanda wan ya kevn û dewlemend, muzika Kurdi, jiyana wan ya cıwaki (sosyal) bı gelên Sovyetistanê bıdım naskırın. Film, sê caran dı televizyonê da, lı seranserê Sovyetistanê û herusa lı hemû welatên sosyalist hate nişandan. Wek we ji dıt, mın xwestiye ez dı vê filma dokumenter da,


ji gelek aliyan va Kurdan bıdım naskırın, lê pır mıxabın ku film kurt e, tenê 35 deqiçe ye, têrê nake.

—Dı bernama we da, disa lı ser Kurdan çêkırına filman heye, bı awaki gıştı, rewşa Kurdistanê rewşa siyasi?..

—Daxwazeke mıne usa heye. Em dıxwazın pêşiyê lı Kurdıstana İranê û Iraqê mecal bıbinın û lı wir filmeke du saetan bıkışının. Herusa lı welatên Ewrûpayê, rewşa karikerên Kurd dıxwazım bıkıım babetê filmeke.

Filma " Em Kurd in", yek ji bıstûşêş filmên Çûbabria ye

NAVEROKA PIRTÛKA WÊNEKÊŞÊN KURD



TÊMÛRÊ XELIL

Dî sala 1980'an lî bajarê Tîblîsê dî "Sera Mala da temaşegeheke efrandîmên wênekêşên Kurd Antonê Mirze û Besa Payele hate vekîrîn. Serokê komela Komara Gurcîstanê yê tiyatroyê Alekzîdze, sekreterê serwêrtiya yekîtiya wênekêşên Gur-

cîstanê Todriya û ên mayî qîmeteki mezîm dane van xebatên wênekêşên Kurd. Temaşevanan ew çend roj bûn jî jî vê temaşegêhê lezeteke baş dîtî.

Temaşegêha wênekêşên bû diharbûna dostî û biratîya van hemû gel û neteweyên bî-

rader yê internasyonal, yê ku lî paytextê vê komara Pîşkavkazê da dijîn.

Ev herdu wênekêşên Kurd niha lî Tîblîsê xebatên xwe dajon û lî vîra jî hatîne dîne. Van herdu wênekêşên Kurd xwendîna xwe lî vî bajari qêdandîne. Herdu jî endamê Ye-



Xebateke Antonê Mirze: Îlustrisîyonek bo destana "Siyabend û Xecê".



BI HUNERMENDÊ JÊHATÎ

SAYDAN RA HEVPEYVÎN

Dî firça wi da, dî pêûskêşiya wi da, azadiyaxwaziya Kurdistan heye; daxwaz, merem û tekoşeriya neteweki heye. Şin, şayi û daxwaza gelê Kurd heye...

Mebesta gelê Kurd ew e ku wek hemû gelan, dî nav azadiyê da, dî nav aşitiyê da, jiyanê mirovi (insani) biji, qedera xwe bi destên xwe binwîse. Lê kedxwar û hêzên kolonyalist dibêjin: "Tu tune yi", " Tu ne miletêki " û " Koletî para te ye ", " Xwedî welat nîni " dibêjin.

Lê gelê me, duh negotiye erê, bî rîza xwe koletî qebûl nekiriye. Îro jî nake. Ew iro jî duh xurttir e, rênastir e. Îdi ne bî gotmên derewîn dixape, ne jî li ber zulmê stûyê xwe xwar dîke. Vê rastiye, iro idi mirov dî her warê jîyanê da dibîne; dî hunerê hunermendan, wênevanan û helbestvanan da, dî şervaniya karker û gundiyanê Kurdistanê da, dî lûla çekê destê pêşmergeyan da dibîne.

Û mirov, dî firça wênevanê welatparêz SAYDAN da jî jîyan, çand, dirok û duwaroja gelê Kurd dibîne. Saydan, min ku bî firça xwe tîfî rûyê derewan, inkarkirîne û zulmê bîke, dî wêneyên xwe da jîyanê, rengan û ramanên xwe dînitirine.

Roja Nû, bî wi ra hevpeyvînek çêkir. Em vê hevpeyvîne li gel çend numûneyên xebata wi pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

ROJA NÛ: Kekê Saydan tu dikani bî kurtî jîyana xwe ji me ra diyar biki?


SAYDAN: Ez dî sala 1954'an li Kurdistanê Bakûr hatime dinê. Bavê min cotkareki biçûk e. Min zarotiya xwe heta dawîya dibistana ewlin dî gundê xwe da derbazkir. Bî pey xerabbûna aborî li salên 60'i, me mala xwe barkir çûn Îstembol'ê. Min perwerdayiya xwe ya navîn li taxeke Îstembol'ê ne-

çar da derbazkir. Jî bo ku min li Tirkîyê imkana xwendina bilind nedît, ez derketim dervayî welat. Dî destpêka 1967'an hatim Berlina Rojava Dûra dî imtîhana yekemin da min mafê xwendinê dî Dibistana Bilind a Sinetkaran qezenckir. Dî pênc salê dibistanê da min bî hinbûna wêne, grafik û wênekîşiyê derbazkir. Dî sala 1974'an da min dibistan qedand.

ROJA NÛ: Hızkırına te ya bî wênanjî çî çaxî virda heye?

SAYDAN: Hızkırın û eleqa min bî wênan dî salên dibistana navîn destpêdike. Lê çî heye ku min wê çaxa xebateke bî disiplin û bî zanetî nekir. Dî salên dawîya dibistana navîn da min karê xwe hê bî disiplintir û bî zanetitir kir.

ROJA NÛ: Çawa tê zanin iro welatê me Kurdistan dî bin şertên dijwartir da ye gora



Meydana cengê : Kurdistan

welatên dîn. Ew dî aliyê çar dewletan da hatiye parvakirin û talankirin. Gelê me dî van her çar parçan da, jî bo mafên demokratik û mirovati, jî bo azadiyê têkoşin dîde. Bî ditina te, dî vê rewşa han da pêwîste xebata sînaetkareki Kurd an jî wênevaneki Kurd çawa be ?

SAYDAN: Dî welatê me da çawa ku çanda me dî bin zordestiyê da ye, war jî şertên pêşveçûna sînatê gelê me pîrteng in. Dî bin van şertan da dî welatê me da pêşvabîrîna sînat û pêşkêşkirîna wi jî bo xîzmeta gel ne mumkun e. Em sînatkarên Kurd nîka lî hember wezîfeyek dijwar mane. Em vê kêmahiyê dîxwazîna lî dervay welat jî nav rabîkîna. Em wênevan nîkanîna xwe jî dûri problemên welatê xwe bigîrin. Em ne politikavan in. Lê belê em mecbûr in ku bî pîrsên civakî ra eleqeder bîbin û jî bo pêşveçûn û başbûna sînatê gel bîxebîtin. Jî bo vê yekê, iro wezîfeyek lî ser şanê me ewe ku, ew çand û sînata civata me ya ku jî navrakîrîna wê tê xwestîna, jî vê navrakîrînê xelaskîna, pêşvabîrîna û binîna dûşa sînatên modernên dîne.

Ez wek wênevaneki ku lî dervay welat dijim, vana xwe ra wezîfe dibînim: Danasîna çand û sînatê gelê min lî gelê gelê dîne, şuxîlandîna tîknîkên modern dî sînatê gelê Kurd da, bî alîkarîya vê pêşvabîrîna û modern kirîna sînatê gelê me, pêşkêşkirîna wi jî bo gelê Kurd, bî vê va bîlîndkirîna moralê gelê Kurd dî tekoşîna azadiyê da...

ROJA NÛ: Lî dervay welat jî yînin tesîrekê lî ser xebata te dîke?

SAYDAN: Bê guman tesîr dîke. Min dîxwest ku ez dî nav gelê xwe da bîjim û bîxebîtin Çî heye ku, dî bin şertên iro da dî welat da bî navê gel xebatek hunermendî pêkanîna ne mumkun e. Min dîxwest ku ez bî gelê xwe ra bîjim. Jiya-


na wi, hêviyên wi, dînya wi ya rengan, lî nêzik raçavbîkîm.

Lê belê ew ne gotîna ku îmkânên pêşvabîrîna çand û sînatê me lî dervay welat tîne ROJA NÛ: Pîrsek dawî, Kekê Saydan. Te dî sînatê xwe da kîjan wênevan jî xwe ra nîmûne gîrtîna, an jî wênevanên ku tu jê hezdîki û teqîr dîki he ne?

SAYDAN: Ez dîkanîm bêjim ku tesîra wênevanên Elmanên ku dî salên Şerê Cihanî yê Duwemin da jîyane û lî ser meselên civakî xebîtîna, lî ser min bûye. Wek Otto Dix, Kette Kolwitz...

ROJA NÛ: Zor spas Kekê Saydan jî bo bersivên te.

SAYDAN: Ez jî jî Roja Nû ra pîr spasdîkîm..



Dê û Zarok



(1880 - 1920)

ELEKSANDER BLOK

"E.Blok Puşkinê sedsalên bistane"

A. Tverdovski

Literatura gelê rûs ya kevneşopi ji wek yê nûjen dewlemend û navdar e ciheki bilind di wêjeya cihanê da girtiye. Wêjeya gelê rûs, ji zûda bi gelek zîmanên biyani tê xwendin, bi inglîzî, firansi, alemani, erebi, tirkî û her wekî din.

Sed cari mîxabin ku mîletê me heta niha gelek kêr wêjeya cihanê bi zîmanê kurdi dixune, sedemên vê kêmaniyê ji wek ji me hemûyan ra diyare, dijminên ricperest in.

Lê, di bawerîya min da, pêwîste em li gor hiwe û mercên xwe, li gor kaniya xwe hêdi hêdi dest bi danasina wêjeya cihanê ji gelê me ra bikin, bê guman, emê têkevin şaşîyan ji, lê zor girînge ku em destpêbikin, li gor vê baweriyê, ez dixwazim di vê gotarê biçûk da li ser helbestvanê gernas û mezî E. Blok rawestim, jiyana wi û du rîstên helbestvanê navdar ji zîmanê rûsî wergerînim zîmanê kurdi. Eleksender Blok di roja 28-11-1880'an da li şarê Petersburgê (Leningradê niha) hatiye jinê, bavê wi Eleksender li zaningeha Warşovayê profesore dademendiyê bû, diya wi Eleksendira qîza hozanê gewre, serokê zaningeha Petersburgê Beketov bû, jina E.Blok Lobov keça zanyarê mezî û li hemû cihanê hatiye naskirin, hozanê ximikê Dîmitri Mendelêv bû.

E. Blok pîraniya jiyana xwe li bajarê Petersburgê derbazkir, ew hin mînal bû dema dest bi nivîsina helbestan kir.

Rûsîya û enînivîsiya Rûsîya li nîk E. Blok pîrsa bîngêhin bû, ji ber ku Rûsîya ji bo E. Blok welatê şoreşan û pîrsên cîvaki bû. Ew rewşa di berhemên xwe da pîr xweş û bi huner nîgar kirîye.

Di van çend malîkên jêrin da bala xwe gelek rind daye karkerên kargehan û çewsandina wan ji aliyê dewlemendan da dîde xuyakirin.

KARGEH

*Di mala cînar da pencera zeri
Li êvaran - li êvaran*

Nalina bêzar dîhat ji burîyan
Milet diçe ber deri

Û deri bî temami girti
Lî ser diwar - lî ser diwar
Mirovek bê lw, mirovek tari
Milet bî hêmin dijmêre.

Ez gîştî dibisim lî jorê
Ew gazi dîke bî dengê zorê
Lî mîletê cîwandi lî jêrê
Pîştên dîmalin daxîn xarê.

.....

24.11.1903

Şoreşa Oktobra mezîna lî Rûsiya bandora xwe pîr lî E. Blok kir, ewî serketîna şoreşê bî dil û can pîjrand û bî gîyana welatperweriyê û pêşverûyê pîroz kir, bî hunereke zor hêja û xurt va poema xwe "Danzde" nivîsiye, poema "Danzde" dî hemû cîhana pêşverû da hat nasin, helbestvan têda rewşa Rûsiya beri şoreşê û piştî şoreşê bî hişmendi û zanineke zor bilind va dîde di yarkirin, wek nîmûne di wir da wîsa dibêje: "şeva reş berfa sîpî". E. Blok di wir da cudatiya navbera derewan û rastiyan, navbera azadiyê û bîndestiyê xuya dîke.

Yevgine Kîmbofets ji kevîntîrin rexnevanê literatura Sovyeti bû, di biranînen xwe da lî ser vê helbestê nivîsiye, gava mîn pexşana E. Blok "Danzde" di rojnamê da dit, mîn ev helbest êvarê lî ser rîya mala xwe lî ber roniyê darkên kîbrîtê xwend....

E. Blok ne tenê xerîki wêje bû, lê hin di karên cîvaki da ji gelek çalak bû ew endamê komîta hukumî ya weşanên literatura kîlasîki bû û hin ji di çapxana literatura cîhanê da bî seroktiya M. Gorki bî jîrbûn dîxebitî.

M. Gorki lî ser şoreşgeriya Blok dibêje: "Bî Blok bawer bîkî! Ew miroveki bê tîrse, rêya rast nişan dîde."

A. Tverdovski lî ser E. Blok nivîsiye: "Bandora Blok hebû û hin ji lî ser helbestên me heye, helbestên wî cîhên xwe di dilên bî milyonan xwendevanan da girtîne."

Helbestvanê navdar û şoreşger V. Mayekovski lî ser Blok nivîsiye: "Karê wî bî xwe heyameke ji pexşaniyê."

Helbestvanê gewre pîr helbest lî ser evîne ji lî hevane, lî jêr, ez yekê ji wan werdigerim.

*Ser qehremanti, lî ser mêranti, lî ser rûmetê
Mîn jîbîrkîr xem û derdên jîyînê
Gava rûyê te di çarçeweki sakar da
Pêşê mîn lî ser masê hildîperê.
Lê dem hat û tu ji malê derketî.
Gustîlka nerxîbîha mîn êvarê avê.
Te qedera xwe da kesekî dîn
Û mîn rûçka bedew jîbîrkîr.
Gelek rojên xerap çûn û hatin...
Vî û evîne eşandin jîna mîn...
Û mîn tu bî bîra xwe anî lî pêşa menberê,
Û wek pîspora xwe da gazi te kir...
Mîn bangî te kir, lê tu lî xwe venegerî,
Mîn hêstêr herîkandî, lê te lî xwe danenî.
Te fîstana hêşîn bêzari lî xwe pêçandi,
Dî şeva xûnav da tu derketî ji malê.
Nîzanim, lî ku warê xwe şehnaz
Te nazdarê, mîhrebanê, dit...
Ez hîşk xew dikim, dibînim fîstana hêşîn,
Ya tu têda çû şeva şebnem...
Nema xewn lî ser mîhrebanê, ser rûmetê,
Hemî derbazbûn, pîspore barkîr!
Bîrûva te di çarçewa sakar da
Bî destên xwe ji ser mase mîn hilda.*

KURDOX

KUŞTINA

HEVALÊ

MIN

M. ARARAT

Êvar bû... Dûrva çira mala apê Ehmed dî-
çirûsi.. Wexta mîn deriyê hewşê vekir, kûçî-
kê rîkêfi mîn kir. Apê Ehmed derkete ber
deriyê malê û gazi kir:

— Ew ki ye?

— Ez im apo, Mecit.. Seyê we çî dreyi,
nedihîşt ku ez bikevim hewşê.

— Keremke Mecit, were. Îro çend rojî şî-
vanê me çûye mala xwe, de pez ji gomê da
ye çî dibe - çî nabe, lema me se girênedaye.

Em çûn hundir. Mîn solên xwe derxist û
derbazi odê bûm.. Meta Gevez piştî xwe si-
partî bû stêr û dîgo, dibiliya...Emrê wê be-
ramberî çîli bû, lê zêdetir nişan dîkir. Dêreki
kevin lî ser, berda pêştmal girêdayî û lî ser
mîlên xwe ji qolcax kişandi bû. Geh hêşîr di-
barand, geh ji bî destmalê paqij dîkir. Rabû
ser xwe, balgiyek dani ber piştî mîn û bona
çay av dani ser êgir...

Mêrê wê apê Ehmed, pêşberî mîn rûniştî
bû. Por û simbêlê wi gewr bûbûn. Jî titûna
Mûşê cixarek dipêça û gulmên zexm jê dîkî-
şand. Apê Ehmed ku dî gundê me da aliye
cotkari û kêlendi kêşiyê da ser xurtiya wi ra
tunebû, wê êvarê bê taqet û pîr xemgîn di-
xuya...

Meta Gevez çay dîda ber me û disa gîli-ga-
zînen xwe dîkir:

— Ho, rebiyo wê çewa be halê me...

Mîn çî dîkir, serwext nedibû.

— Metê —dîgot mîn— wusan xeman neke.
Ka Xalis çî xeleti kîriye? Dîzi kîriye an dû
namûsa hînekan geryaye? Na... wusa nine?
Kurê te xastiye, ku êdî belengazi rabe, Kurd
hîşyar bîn û doza heqê xwe bîkîn.. Ew ji tîş-
teki xîrab nine. Piçekê sebra xwe bine metê!
Helbet vi derdi ra ji aveke zelalê hebe...

Bî van gotînen mîn ra apê Ehmed nerme-

nerm serê xwe dihejand û disa cixarek dipê-
ça. Bî dî gulmên zexm nivî dibû cixara wi...
Wext dereng bûbû, ez rabûm ser lîngan:

— Ezbenî, êdî derenge... Şeva we bîmine
xweş...

Lî malê, mîn serê xwe danibû ser balgi lê
xew nedikete çavên mîn. Rojên bûri dihatin
bîra mîn... Xalis hevalê mîn bû. Em tev diçû-
ne dibîstanê. Hevaleki qenc û dibîstanê da jî
zaf jir bû. Dersdar jî pîr jî wi hez dîkir... Pîştî
kutabûna dibîstanê, bavê mîn ez kîrim berx-
van. Lê daxwaziya Xalis xwendin bû. Carna
jî mîn ra dîgot: "Ezê bîçîm bajêr û dibîstana
dersdariyê bîxwinim. Ku mîn dibîstan qe-
dand, ezê vegerim, Xezalê bîxwazim û bîbîm
dersdarê dibîstana gundê me."

Lê çendeki berê Xalis û gelek hevalên wi
hatin girtinê.. Mîn jî dê û bavê wi ra negot,
lê weke salix dîdîm, zaf lêdanê... Ka axîrî çî-
wa dibe...

Rojekê em bîntara gund lî zewiyê bûn. Ber
wê germê, em jî tapûr-xîroman jî sewt ketî-
bûn. Em ber partekê rûniştî bûn, me dew ve-
dîxwar û westa xwe distand.. Paleki dîgot:

— Xwedê hîz bike, şeş rojan şîxulê vê ze-
viyê wê bîqede.

— Wele xîlas nabe, mala te vê germê qe-
xebat dibe..., dîgot paleki dîn.

Nîşkêva Cebîr rabû û got:

— Hevalno ca mêze bîkîn! Sîwarek jî gund
derket, weke teyrokê berbî me tê, ew çî he-
be sîwarê hawarê ye.

— Em rabûn û leq sîwar revin. Gelo çî qe-
wîmî bû ? Wexta em nêzîki wi bûn, me pîrs
kîr:

— Ûsiv te xêre?

— Wele ne xêre, Xalis ber lêdanan hatiye
kuştin. Du cendîrman meytê wi anîn nava
gund.

Ax.... Serê mîn gêj bû, bîna mîn çîkya û
çavên mîn reş bûn. Ew çî ecêb bû... Nîzanîm
ku çawa hatîbûm nava gund. Şîneke giran
bû. Gundi hemû dor meytê kom bûbûn.. Dûr-
va Xezala bê mîraz ser gomê, nav kîncên reş
da dîxuya... Zare - zara meta Gevez diçû ez-
mana... Apê Ehmed jîpê sekîni bû û cixara
xwe vêdixist. Bî gulmêke zexm nivî dibû ci-
xara wi... Meytê Xalis pêş çavên mîn bû.
Nava xwinê da nedîhate naskîrinê, tenê cotê
gorên kurmancî yên dî piyan da...

Rojên bûri ber çavên mîn ra derbaz di-
bûn... Xalis pêşberî mîn sekîni bû, dîkeniya û
dîgot: "Ezê vegerim, Xezalê bîxwazim û bî-
bîm dersdarê dibîstana gundê..."

1,Ê GULANÊ NIŞANA TÊKOŞINÊ YE



1 Gulan bî naveroka xwe jî karkerên dinê ra bûye nişana tekoşinê, parastina mafê karkeran û şerê dijî zordariyê. Dî 1'ê Gulanan da dilê hemû karkerên dinê û gelên bindest bî yek dengê lêdixe. Vi dengê hanê xewnê zordaran, kapitalistan û kolonyalistan direvine. Kedxwarên dinê jî bo fetisandina vi dengê hanê, çî jî destê wan tê texsir nakin û di navbera karker û gelên dinê da tove dijnatiyê dîşinin. Emperyalist, jî bo parvekirina dinê û kojandina gelan, dinê berbî şerek atomî va dîbin û bê şerm xwe wek "parêzkare domoqrasiyê" dîdînişandan. Lê em baş dîzanin, ku wana palyaçoyê derewkar in, dijminê karker û gelên bindest in; şerxwaz in û dijminê aşitiyê ne. Ew hevalbendê zulmê, dostê hukmên faşî ne. Ku bî dest û rayên wan lî gelek welatan hukmên faşî tene sazîrînişan û tekoşina gelan tene fetisandin.

Dî dema iro da, ku 1'ê Gulanê dî dinê da bî şahî û bî dengê xurt tê pirozkirin, lê mixabînişan lî Tirkîyê û lî Kurdistanê barbarî û kedxwariya nedîti dî bin nîrê faşîzmê da dajo û 1 Gulan hatiye qedexekirin. Hovitiya generalên faşîst navbera erd û ezman dagirtîye. Gelê me jî 40 salî vîrda birçîbûn, êşkence, qîrkîrînişan û talanek weha nedîye. Jî 6 salan vîrda hukmê faşî, lî ser navê demoqrasiyê kuştin, zindan, êşkence, qedexekirin, birçîbûn û kevneperestî û nijadperestî sazîrîye. "Demoqrasî" ya generalên faşîst ev e lî Tirkîyê û lî Kurdistanê.

Em iro jî welatê xwe dîr, lê welatê me û

gelê me dî dilê me da ye. Lî hember faşîzmê û koledariyê dî 1'ê Gulana 1986'an da jî hercar xurtîr û bî hêztîr in. Komela me KOMKAR - Swêd jî hersal çêtîr û bî hejmarekî xurt dî milê karkerên Swêd da lî hember emperyalîzmê, faşîzmê, koledariyê û şerê atomî meşîya. Lî dijî barbarî ya generalên faşîst ya xulamok dengê xwe bilind kîr, mîl da şerê aşitiya cihanê, tekoşina karkerên dinê û gelên bindest.

Berya 1'ê Gulanê hemû endamên KOMKAR bî dil û can xebatek kollektîvî sazîrînişan û bî her hawayî hazîriyek hêja pêkanînişan. Dî 1'ê Gulanê da, lî pêş ala me ya rengînişan, lî dû wi flama komelê û flamayek gelek mezînişan ku şikandînişan zincîrê koletîyê û biratiya gelên dinê sembolîze dîke, çek - libasên netewî, xurtbûn û disiplînek hebû. KOMKAR-Swêd bî vî hazîriya xwe bala temaşevanan kîşand û bî nîmûneyek hêja dî kar û xebatên kollektîvî û rêxîstînişan da. Dî meşê da û dî meydana cîvandînişan da bî zîmanê Swêdî "Kurdîstan Înfî" (ev broşûr jî alî KOMKAR'ê va du meha carek tê weşandînişan), belavokek bî sê zîmanan — Kurdi, Tirkî, Swêdî— hate belavkîrînişan. Filma meşê bî seranserî hate kîşandînişan.

Dî 1'ê Gulanê da çend sloganên bijare jî weha bûn :

- BIJÎ 1 GULAN !
- BIMRE ŞERÊ ATOMÎ, BIJÎ AŞITÎ !
- BIMRE FAŞİZM
- BIJÎ AZADIYA KURDISTAN !

bı serfirazi pêk hat

KOMCIVINA KOMKARÊ YA 8'AN



Komcivina Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan - KOMKAR'ê, dı rojên 7 û 8'ê Hıziranê da lı bajarê Kolnê pêk hat. Komcivina isal, druşmên (şiar) "Mafê wekhevî bo Kurdên ku lı Elmanya Federal dıjin", "Mafê hılbijartına navçeyi", "Mafên mirovti û demoqrati bo Tırkiyê û Kurdistana Tırkiyê" hılbijart.

Dı komcivina Komkarê da bêtiri 500 kes amade bûn û dılaşahi û piştgiriya xwe bı Komkar'ê ra diyar kırın. Berpirsiyarên gelek rêxistinên Kurd, Tırk, Elman û neteweyên (millet) dın, dı civinê da amade bûn, herweha qasi 40 rêxistin û kes mesajên piştgiri-

riyê şandın. Komcivin jı aliyê serokê KOMKAR'ê hate vekırın. Yek berpirsiyarên Konseya Netewî ya Efrîqayê (ANC) Partiya Sosyal Demoqrat a Elman (SPD), Partiya Komunist a Elman (DKP), Dêra Protestan û çend rêxistinên dın, dı komcivinê da peyivin û bı vi awayi piştgiriya xwe jı gelê me ra û jı Komkar'ê ra diyar kırın.

Mesaja Sekreterê Gışti yê Partiya Sosyalist a Kurdistana Tırkiyê - PSKT, lı ser piyan, bı gelek tezehûrat hat xwendın. Druşmên: "Biji Azadiya Kurdistan!", "Biji Partiya Sosyalist a Kurdistana Tırki-

yê !" jı aliyê hemû beşdaran hatın gotın.

RAPORA KOMİTA BİRÊ-VABIRINA GİŞTÎ

Komcivinê, dı nav herdu rojan da lı ser rapora Komita Birêvabirına Gışti sekimi, kar û xebatên sala bori hatın raçavkırın û rûspikırın. Lı ser pirsên dın ku dı bernama xebatê da hene munaqêşe hatın kırın, bıyarên nû hatın girtın û komita serweriya nû hat hılbijartın.

Bı kurti, xebatên ku KOMKAR'ê, dı sala çûyi da bı serfirazi pêkani bû, dı rapora xebatê da weha hatibû diyarkı-

rın: "Pıştıgıriya tevgera aşitiyê û bêçekdariyê, xebat ji bo mafên karkerên Kurd lı Elmanya Federal, lı diji teror û êşkenca lı ser gelê Kurd, pıştıgıri ji bo gırtiyên siyasi û efûya gışti û herweha gelek xebatên çandi (kultürel), weşan (rojname, kovar, pirtük û hwd), xebat ji bo cıwan û jınên Kurd hatiye kırım.

Dı raporê da herweha tê diyarkırın ku KOMKAR her diçe xurttir dibe; hejmara endaman lı gor salên çüyi zêdetır bûye û komiteyên karkeran yên nû tevi federasyonê bûne. Dı hêla abori da hatın û çüyinên federasyonê, ji sıse-yek yek zêdetır bûye.

BIRYARÊN KOMCIVINÊ

Komita Birêvabırına Gışti 6 biryar pêşkêşî ray û deng-



Dı roja pêşin a komcivînê da, şeveke çandi hat amadekırın.

dana nûneran kır :

• "Têkoşin bo aşitiyê. Pıştıgıri bı Têkoşinên Çini û Netewi ra".

• Hebûna Karkerên Kurd lı Elmanya Federal Bê Naskırın".

• "Diji Nijadperestiyê Mafê Hilbijartinê bo Biyaniyan"

• "Parastina Mafê Sendikati".

• "Bo Pıştıgıriya Têkoşina Azadiya Gelê Kurdistan".

• " Diji Dardakırın, Êşkence û Têrorê. Ji Gırtiyên Siyasi ra Azadi "

Her şeş biryar bı dengeki gışti hatın qebûlkırın.

MESAJA ROJA NÛ

Hevalên Hêja

Komkar êdi bûye nişana têkoşina karkerên Kurdistan lı Elmanya Federal. Ev têkoşin iro dıkeve 8 saliya xwe.

Jı roja sazûna xwe heta niha KOMKAR'ê bêwestan û bêsekın ji bo mafên karkerên Kurdistan lı dervayi welat bı dil û can kar kır. Ji bo parastina mafên abori-demokratik, ji bo pêştabırına zıman, çand û karên huneri, lı diji bêkariyê, lı hemberi neyari ya lı diji biyaniyan û lı hemberi şer, Komkar'ê berpırsyarên xwe dı warê tekoşinê da yek-yek ani cih.

KOMKAR'ê giraniya xebat û tekoşina xwe bı taybeti lı diji kolonyalizm, emperyalizm û faşizmê seferber kır.

Jı bo eşkerekırına rûreşiya iktidara faşist lı Tırkiyê KOMKAR'ê hertım alikari û pıştıgırtiya xwe lı bal tekoşina

gelê me lı diji faşizmê nişan da û bı aktifi dı vi wari da kar kır.

Lı Kurdıstana İran û Iraqê hêzên dijmin û neyar lı diji gelê me şereki mırın û jiyinê dajon. KOMKAR'ê heta niha bı berpırsiyari lı diji vi şeri xebatên hêja pêkaniye.

Bı kurti KOMKAR'ê hemû hêz û imkanên xwe ji bo Kurdıstaneke azad û demokratik seferber kır. Ji ber vê yekê ye ku dı nav gelê Kurdistan da ciheki giring gırtiye.

İro dost û dijmin ji xurtbûn û armanca tekoşina KOMKAR'ê baş dınase û dızane. Ji ber vê yekê KOMKAR dı çavên dijmin da bûye kelemeki tûj. Lê belê cehda dijmin bedilhewaye lı hember xebata gelê me.

Bı sılavên şoreşgeri û dilgermi serkevtın dıxwazın.

— BERBIPÊŞ JI BO KOMKAREKE XURTTIRİN !

— BİJİ KOMKAR ! Redaksiyona ROJA NÛ

Ji Xwendegeha Mamostatiyê

MAMOSTAYÊN KURDÎ YÊN PÊŞIN MEZÛN BÛN

Ji Xwendegeha Mamostatiyê, mamostayên kurdi yê pêşin mezûn bûn. Wek tê zanin ev cara yekemîn e, li welateki Ewropayê, di xwendegeha bilind da, mamostayên kurdi hatine amadekirin. Piştî xwendina du salan, nuha 9 mamostayên dersên kurdi diploma dersdariyê wergirtine û vê payizê wê dest bi mamostatiya zimanê kurdi bikin.

Beşa Kurdi Çû Sovyetistanê

Xwendekar û mamostayên beşa kurdi, di meha Nisanê da çûn Sovyetistanê. Li Swêd xwendekarên biyani yê ku di Xwendegeha Mamostatiyê da dixwinin, mafê wan heye ku herin welatê xwe û 21 rojan li wir praktik bikin. Beşa kurdi ku ne xwediyê mecaleke usa ye weki here welat, 3 hefteyên praktikê li Sovyetistanê derbaz kirin. Di nav van sê heftan da, ew çûne Leningradê, Moskva Rewan û Tibilisê, ciyên ku kurd û merkezên kurdo-fojiyê lê hene.

R
A
X
I
S
T
I
N
E
K



Raxistinek (Sergi) navbera 5-7'ên meha Gulanê 1986' da li Bollnesê bi destê welatparêzên Kurd di pirtûkxanê da (kutuphane) hate amadekirin.

Di vê raxistinê da gelek weşanên bi zimanê Kurdi, Ingilizi, Swêdi, Elmani û Tirki, kincên gelêri li serheykelan û gelek wêneyên cûre-cûre hatibûn danin.

Qasi ku raxistinê berdewamkir pîr

mîrovan temaşekir û bala wan kîşand. Ji ber ku ev raxistina han li Bollnes cara yekemîn bû, hatibû vekirin.

Gelek weşanên bi zimanê Ingilizi, Elmani û Swêdi (ku di derheqa Kurda û Kurdistanê agahdari (informasyon) didan) ji aliyê mîrovên ku raxistin temaşekirin hatin stendin.

Rodi

27/5/1986 BOLLNÄS

* Ji berhevoka Zargotina Kurdi ya Celilê Celil hatine wergirtin.

■ MALA BÊ NAN Û AV

Merivek diçe gundeki bî mêvani. Diçe mala meriveki kal. Sibê rûdîne hetani êvarê, lê ne nan jê ra tinin, ne ji avê tinin.

Xort radibe bî gavan odê dîpive, çirka çend gav dirêjaya wê ye, çend gav beraya wê ye.

Xweyê malê tê -dîbê- Xortê delal tu çi diki ?

Dîbê: - Xalo ez dixwazim otaxeke ha çêkim.

Dîbê: - Wê ji tera çetin be, xortê delal.

- Xalo can, -dîbê- çêkirina otaxa, bê nan-av çira çetin e ?

■ NAV DIPIRSE

Xortek rasti yeki kal tê, dîbê:

- Xalo navê te bî xêr ?

Dîbê: Navê min Heso ye.

Dîbê: Xalê Beso navê bavê te çi ye ?

- Erê, -got- te navê min zef rast got weki niha ji navê bavê min dîpirsi ?

■ BETER Û BESBETER

Du rêwi rasti hev tîn. Yek ji ê dinê dîpirse, dîbê:

Navê te bî xêr, bira ?

Got : Navê min Beter e.

Ew xwexwe fikiri, go "min navê xwe got, hela ez ji wi camêri bîpirsim navê wi çi ye ?" Beter pîrsi, got:

- Lê navê te çê ye bira ?

Hevalê dinê fikiri, go: " Evi navê

xwe go Beter, Ez navê xwe çî bêjim

Go:

- Navê min ji Besbeter (yani ji better xiraptir).

■ PAŞA

Du meri (mîrov) rasti hev tîn. Navê herduyan ji Paşa bû ye. Paşayek zîmanê wi hîneki giran bûye. Dîbê:

-Navê te bî xêr ?

Dîbê: Navê min P-p-p- Paşa ye. Lê navê te çi ye?

Dîbê: Navê min ji Paşa ye, lê ne hewqas dirêj e.

■ WEKÎ BIBEZÎ TÊ BIWESTI

Carekê qaçaxek rasti meriki tê, Qaçax siyari bûye. Wexta qaçax siyari dide pey, peya dibeze.

Gelek erd dibeze, dîweste rûdîni.

Qaçax tê dî serra dîsekîne.

Peya dîbê: - Apo ez westiyam.

Eva ji dîbê: - Bavê apo, ki ji tera go bibeze, weki bîwesti.

■ KUNDIRÊ MEZIN

Yeki go: - Min kundirek lî deşta Rewanê avitiye, tûra wi gîhiştiye çiyayê Elegezê.

Yeki ji go: - Min sitlek ditiye, çîl meri dî hundurê sitlê da dîxebîtin, dengê çakûçê yeki nedîçû ê dinê.


Ewê pêşî go: -Mala vê virê (dere-wê) şeviti.

Ewi ji go: - Giliyê min çîma derew e? Ne axir kundirê tu dîbêji ancax dî wê sitlê da bî ci dibe.



ZAROK

ÇIROKA SE MIH Û GUR



Seyeki (kûçık, seg) navgundi, mihe-ke kulek û gureki bêfem hebûye.

Se, dı dema xwe da geleki jir bûye. Lê çı mıxabın ku pırbûnê idi jırbûna wi bıkrıye. Jı bo ku bıkarıbe jıyana xwe bıdomıne, dıkeve malan xwarınê dıdıze. Perıřan, çav bı bırin, purt lı ser pıřtê nemaye... Jı rojan rojek, dıçe ber xanıyeke disan dızıya xwarınê bıke. Dınıhêre lı ber derê malê miheke grêdayı, bend dı qırıka mihê da rûnıřtiye û jı fırnkên (poz) wê xwin davêje. Dılê se geleki bı rewřa mihê dıřewite, alıkarı dıke û berdıde.

Mih, serhatıya xwe jêra dıbêje: "Demekê rûmeta mın lı ba xwedıyê mın geleki hebû. Rojekê jı çıya kevrık řıqtı û hat lı cênıga mın ket û seřet mam. Jı bo ku ez nekevım zevıyan hertım wısa mın grêdıdın. Çêre nema ez bıçêrım, tenê erdê hıřk û kevrık lı dor - berê mın. Vi alı, wı alı dıçım û têm, bend lı gewrıya mın dıřıde. Vê rewřa han dı çıçıkên mın da řır jı mıçıqand. Ez jı vê jıyanê ne razi me."

Se jı, behsa jıyana xwe jı wê ra dıke. Mih vedıgere ser se û dıbêje: "Jıyana me wek hev e. Weha nabe, were ez

û tu em bı hevra serê xwe hıldın û jı vi welatı herın. Lı zozanan ez bıçêrım, jı çêrê, jı çıçek û kulılkan řır bıdım te, tu jı bıjı ez jı... Lê gerek tu mın jı hırc û guran bıparêzi."

Ev gotınên han lı se xweř tên. Ew bı hevra berê xwe dıdın zozanan. Mih dıçêre, jı çêran, gul û kulılkan řır dıde se. Se jı mihê dıparêze. Dem dıbore û pıřtı mehekê se wısa bûye ku hewte hewt jê tê. Lê belê navgundıtı û dızıya mast û řırê malan dıkeve bıra wı û qapaxa serê wı radıke...

Se: "Xwiřkê, ez bı te tıřteki bıřewırım. Tu destûr bıde mın, ezê bıçım gund. Mayına mın û vıra tucar nabe".

Mih, lı ber se dıgere, tê û dıçe, bı lıva û tıka: "Bıra, bıra peymanı me hebû!... Te ew peyman jı xwe bıkrık?" Qelewbûna se nayê hesab. Lê çı feyde navgundıtıya wı, carekeı daye serê wı. Mih kûr kûr dıfıkıre û dıbêje: "peymaneke dın em dayın. Tu jı bo rojekı dıkarı bıçı gund". Se, vê peymanê qebûl dıke. Mih û se, bı hevra heya çıyayê lı ser gund tên û pařê xatır jı hev dıxwazın. Se berê xwe dıde gund. Mih bı tırs lı çıyê dımine, em werıne rewřa se.

Se ji bo rojeki hatibû gund. Lê belê çend roj di serra derbaz dibe. Ji birçiyana disa dızıya xwarinê, şir û mastê malan dıke. Çend roj dibin çend hefte Se dıkeve rewşa berê. Peymana xwe û mihê jibir dıke.

Mih, ji bo ku bıkarıbe xwe bıparêze, bı şev dıkeve nav zımaran, bı dıleki tırs demê dıborine.

Gur, dû nêçıra xwe ketiye û dıgere. Ew û mihê va lı ciyeke rastê hev tên. Bı fesal tê cem mihê û gepa xwe vedıke. Mih dızane ku wê bıbe xwarına gur. Ji gur ra: "Ez dızanım ku tu wê mın bıxwi. Lê qewleki (şert) mın heye". Gur, guh dıde ser qewla mihê ka wê çı bıbêje... Mih: "ez çend meha ji refên xwe qetiyame, mın berxa xwe ji zû da neditiye. Lı ser vê yekê dilê mın geleki dışewıte. Lê ez heyrana te, tu dıkarı ji mın ra çend stranan bılorını. Pey wi ji bı mın çı dıki êdı tu dızanı".

Gur, gureki gelek birçi bû. Jiyana wi ji bı derd û kulan boriye. Ser van gotınan dest pê dıke: "hû hû hû hû û û û..." Mih dısan dıbêje: "kerema xwe pariki dırêjtırke. Dengê te geleki lı mın xweş hat". Gur : "hû hû hû û û" geleki dırêj dıke.

Ev deng, di gund da hemû seyan (segan, kûçikan) hışyar dıke. Tê bira seye navgundi ku peymana wi û mihê hebû. Ser vê yekê berê xwe dıde çiya.

Gur pêda pêda nêziki mihê dıbe û jêra : "Êndi bes e, ez ji geleki birçime. Mih : "Ez goriyê te, qewla camêra sê (3) car e, te du car ji mın ra lorand, ma carek. Ca qurban vê cara xwe ji bıstire û paşê...". Gur dest bı zûre zûre dıke nake, se xwe davêje nabeyna gur û mihê. Gur bı zikê birçi ji wê derê direve û bina mihê tê ber.

Mih, baweriya xwe bı se nayne. Ji se ra dıbêje: "Bıra, tu lı ser peymanan nasekını, pêwıste em bıçın gund. Se qetiya mın nemaye, lê birçibûna te hertım lı ber te ye. Se lı ber mihê dıgere: "Xwişkê ez ji nuha şında, lı ser peymanan dısekinım û gotına xwe bı cih tinım". Ev gotınên se mihê qanı nake û bı hevra dızvırın gund.

Birçibûyına gur dıde serê gur. Vırda wêda rastê hespeki kulek tê. Ji hespê ra: "Ezê te bıxwım".

Hesp: "Ez dızanım tu wê mın bıxwi lê xwediyê mın, careki ez bırim nalbend, bızmarek bı şaşıtı, di lingê mın da kutaye. Ca bı kerema xwe wi bızmari ji lingê mın bıqşine ku ez pariki rehet bıkıım û bıla di gewriya te da ji nemine". Gur dıçe paş hespê ku bızmar bıqşine. Hesp çıqas jê tê pahineki di nav serê wi da lédıde û dıreve. Çend saetan şında hışê gur tê seri. Ji birçiyana bê taqet e. Bı xwe bı xwe:

*"Kuro bavê te dengbêj tu dengbêj
Lawo bavpirê te nalbend tu nalbend!?"*

dıbêje.

○○○

SIMO
Berlina Rojava



" KURD - ÊZDÎ " XAÇATÛR ABOVYAN

Îsal, li Erivanê, di nav weşanên "Hayestan" da pirtûkeke Xaçatûr Abovyan, bi zimane kurdî hate neşîrkirin.

Di vê pirtûkê da, biraninên ronakbirê ermeni yê mezîna 19'a, hûmdarê edebiyata ermeni a nû, dosteki gelê kurd, Xaçatûr Abovyan, hatine berevkirin. Abovyan, di van biraninên xwe da behsa jiyana gelê kurd ya ciwaki dîke, ji erf-edetên kurdan, ji zargotina kurdan nîmûneyan dide. Pirtûka Abovyan, bi agahdariyên diroki-çandî va gelekî berjewendî û bi nîrx e. Ji aliyê Wezîrê Eşo, ji zimanê ermeni hatiye wergerandin.



"TÛRKÇE İZAHLI KÛRTÇE GRAMER" DR. KAMURAN ALÎ BEDİR - XAN

Ev rêzmanî Dr. Kamuran Elî Bedîr-Xan cara yekem, di sala 1977'a da li Tîrkiyê di nav weşanên " Özgürlük Yolu " (Riya Azadî) da hatibû neşîrkirin. Ev berhema han ku Bedîrxan bi şîrovekirina tîrki ji bo Kurdên Tîrkiyê amade kirîye, îsal, careke din di nav weşanên " Özgürlük Yolu " da derket.

" KURDISH PROVERBS " EMSAL VE HIKEMÊ KURDÎ "

(Gotinên Pêşîyan)

QADIR FETAHÎ QAZÎ

Di vê berevoka 616 rûpelan da gotinên pêşîyan yê kurdî hatine berevkirin. Ew bi tipên erebî û latîni bi hevra hatine nivîsin û bi farisî hatine şerhkirin. Berevkar û amadekarê pirtûkê Qadîr Fetahî Qazî ye. Pirtûk, îsal(1986) ji aliyê zanîngeha Tebrîzê hatiye çapkirin. Tiraja wê 1500 e.

" TÂRAR OCH KONST " FIRMÊSK Û HUNER " -GORAN

Berhema şairê Kurd Goran, ya bi sernave "Firmêsk û Huner" bi zimanê Swêdî û Kurdî (bi tipên latîni) bi hevra hate çapkirin. 20 helbestên GORAN ji aliyê Lars Backstom, Bextiyar Amin û Ferhad Şakelî hatine wergerandin. Di pirtûkê da li ser jiyana û efrandinên Goran ji, bi kurdî û swêdî agahdariyên dayin.

" KILAM Û MIQAMÊD CIME'TA KURDA (Pirtûk - 2) " CEMÎLA CELÎL

Pirtûka duwemîn ya " KILAM Û MIQAMÊD CIME'TA KURDA " ya muzisyen û folklorîsta Kurd Cemîla Celîl, îsal li Moskovayê hate çapkirin. Di berevokê da 92 kilam (stran) û 9 mîqam cih digrin. Li gel tekstên kurdî wergera wana bi rûsî ji hatiye çapkirin.

Wek tê zanîn pirtûka yekemîn ya vê xebata Cemîla Celîl di nav weşanên Roja Nû da ji derketibû.


DERDIKEVE !

NÛBAR'a EHMEDE XANÎ wê di demeke kurt da di nav weşanên Roja Nû da derkeve.




NÛ DERKETIN!

Weşanên ROJA NÛ, çar pirtûkên nû derxist. Sê(3) ji wan diwanên sê helbestvanên Kurd yê welatparêz û şoreşger in. Ya dîn ji ya şa'irê Kurdi yê nemir Feqiyê Teyran e.




" LI SER RÊYA CEGERXÛN " , Gundi

Berevoka helbestên Gundi, bi sernavê "LI SER RÊYA CEGERXÛN" , ji 80 helbestan pêktê. Di helbesta kurdi ya hevçaxi da, Gundi dengêki nû û xurt e. Ev pirtûka wi ya duwemin e.




" ŞÊX SEN'AN " , Feqê Teyran

Destana " ŞÊX SEN'AN" ya hozanê edebiyata kurdi ya kîlasîki Feqiyê TEYRAN, ya ku di sala 1965'an da ji aliyê B.M. Rudenko hatibû amadekirin û çapkirin, vêcarê di nav "Weşanên Roja Nû" da hate weşandin. Ew ji aliyê Memo Yetkin da hatiye wergerandin bo tipên latîni. Di destpêka pirtûkê da , bi îngilîzi, pêşgotîneke Yetkin û pêşgotîna Rudenko li gel bendeke Mc- Kenzie ci digre. Li ser daxwaza Roja Nû, mamosta Qanatê Kurdo ji bo vê pirtûkê li ser kurdzan B.M. Rudenko û Feqiyê Teyran pêşgotînek nivîsiye.



" DAXWAZNAME " , Nami

Diwana NAMÎ (Mela Ehmed) gerek e mêjda hatibûya çapkirin... Lê şa'irê welatperwer, hetani roja mirina xwe ji, serbestî û mecal neditiye ku helbest û sîrûdên xwe çap bike û di nav gelê xwe da belav bike. Helbestên wi, bûne sitran û sîrûd (marş) di nav gelê me da tene gotin. Sîrûda " Brayên delal hûn werin kurdino " yek ji helbestên Nami ye.



" EM Û DIJMIN " , Seydayê Keleş

Helbestvaneki gelê me yê dîn ji, ku heta nuha gelek caran helbestên wi jê hatine standin û şewitandin, Seydayê KELEŞ e. "EM Û DIJMIN" diwana Seydayê Keleş ya yekemin e. Di vê diwanê da 50 helbest hatine berevkirin.

